

Ev tê çi maneyê...?

... Ji bo dibistan, perwerdehî, û kar

- Zarokên kur û keç xwedî maf û berpirsîyarîya xwendina di dibistanê de ne. Xwendina di dibistanê de heta pola 9'an ji bo hemû zarokan mecbûrî ye.
- Hemû mêr û jinên ku li Almanyayê ne xwedî mafê perwerdehîya azad in û dikarin bi awayekî azad pîşeya xwe hilbijêrin. Ev maf nikare were înkarkirin ji hêla endamên malbatê, heval an jî hevjinan ve.

... Çimku perwerdehî û karîyer muhîm in ji bo jîyaneke serbixwe û ji bo bûna beşeke civaka li Almanyayê. Ji bo bûna beşeke wekhev a civaka koçber hewcedarî bi qebûlkirina yasayan û mafên ferdî heye. Jinek nayê naçarkirin ku bikeve bin asta mêrekî.

Tê wê maneyê:

Her jin xwedî maf û azadîyê ye ku li gor têgihîştina rola xwe bijî. Zexta li ser jinan nayê qebûlkirin. Zagona bingehîn rûmeta hemû mirovan diparêze, mafên wekhev ji bo hemû jin û mêran garantî dike.

Em bi hev re bixebitin
ji bo pêkanîna van nirxên bingehîn ên
di civaka me de.

Pirskirin û çareserkirina pirsgirêkan, û wergirtina alîkarî li Niedersachsênê

Ji bo hemû pirsên derheqê bi awayekî wekhev jîyana bi hev re, Li Niedersachsênê servîseke şewirmendiyê heye "G mit Niedersachsên" bedewa ye hejmara telefonê **0800 – 14 24 34 5** û bi rêya emailê li **g-mit-niedersachsen@vnb.de**
Hûn dikarin werin zanyarî û servîsên ku tên pêşkêşkirin, bibînin malpera me: **www.g-mit-niedersachsen.de**

Jîyaneke bi mafên wekhev, ewle û dûrî şidetê ya li Almaniya û Niedersachsênê, eger her kes maf û berpirsîyarîyên xwe bizane û wan pêk bîne û li gor wan nirxên ku ji hêla zagona bingehîn ve hatine pejirandin bijî, mumkun e. Kesên ku wisa hîs dikin ku mafên wan tê tehdîtîkirin divê le alîkarîyê bigerin. Li Niedersachsênê, **heye ku gelek alîkarî tê pêşkêşkirin** Ji bo pirs û pirsgirêk û rewşên lezgin:

- Eger hûn li rastî şidetê hatibin, gef li we hatibe xwarin an jî bûbin şahidê şidetê: Ji polîs re telefon bikin **110**.
- Her wiha jin dikarin serî li navenda şewirmendiyê ji bo jinên ku li rastî şidetê tên, bidin, "Suana" li "kargah", telefon **0511 – 12 60 78 14** yan jî xeta alîkarîyê ya di asta neteweyî de "Gewalt gegen Frauen" Violence against women hejmara telefonê **08000 – 116 016**, bedewaye. Alîkarî bi gelek zimanên cihê tê dayîn.
- Niedersachsen xeteke krîzê pêşkêş dike ji bo jin û keçên ku bi zorê tên zewicandin. Bi xeta bedewa alîkarî û şewirmendî tê dayîn hejmara **08000 – 0667 888**.

Verein Niedersächsischer Bildungsinitiativen e.V. (VNB)
Projekt **G mit Niedersachsen**
Am Marstall 15, 30159 Hannover, tel. 0511 4500188 1
xeta alîkarî û şewirmendiyê **0800 – 1424345**
Email: g-mit-niedersachsen@vnb.de
www.g-mit-niedersachsen.de
www.facebook.com/g-mit-niedersachsen 

Mezin dibe bi hev re li Niedersachsen

Birêxistina jîyana bi hev re
Rêzikên jîyana bi hev re

Li Niedersachsênê bi awayekî aştîyane jîyana bi hev re girîng e ji bo me hemûyan. Ji bo ku derfeta bîcîhbûna mirovên ku ji çandên din tên ji wan re were dayîn em vê broşurê ji bo dayîna zanyarîya li ser li ser rêbazên sereke yê jîyana bi hev re didin.

0800 – 14 24 34 5 telefonkirin bedewa ye 

Zagona bingehîn

Rêzikên bingehîn

Ji bo jîyana bi hev re

Zagona bingehîn zemana herî girîng a yasayî ya ji bo bi hev re jîyana me ya li Almanyayê. Ev, çarçoveya legal ya civaka me pêk tîne. Ev maf û berpirsîyarî ji bo hemû mirovên ku li Almanyayê dijîn li dar e û ne girîng e ka ka ew li vir hatine dinyayê yan jî koçî vir bûne.

Madeya 1ê. (1)

"Rûmeta mirovan nayê binpêkirin."

Her mirov xwedî mafê jîyana bi rûmete û heta ku mafên mirovên û yasayên Alman bin pê neke her kes li gor bawarîya xwe dikare bijî.

Madeya 3'an. (1,2)

"Hemû mirov divê li pêş yasayan wekhev bin."

"Mêr û jin divê xwedî mafên wekhev bin."

Xala girîng a bi hev re jîyana me ew e ku jin û mêr xwedî mafên wekhev in.

- Ji ber cinsîyetê tu cihêkarî di nav mirovan de nayê kirin.
- Her jin û mêr xwedî wan maf û azadîyan e ku bi fikra xwe bijî û biryarên xwe bigire.
- Bi rêya îstîsmara fizîkî û hestîyarî azadîya hilibjartinê ya tu kesan nayê bisînorkirin.

Zagona bingehîn û nirxên wê ji bo me hemûyan li dar e di hemû qadên jîyana me de.

Ev tê çi maneyê ...?

... Ji bo hevaltî û malbatan

- Her kes bixwe bikare biryara xwe bide ka ew ê di peywendîyeke hevaltî de an di nav malbatê de an jî bi tena serê xwe bijî. Li Almanyayê gelek awayên cihê yê jîyanê hene ku destûr hatine dayîn wek mînak peywendîya eynî cinsan.
- Mirovek dema ku hevalê/a xwe hildibijêre hîs û tercîh û berjewendîyên wî destnîşanker in.
- Tu kes bi zorê nakeve nav peywendîyekê an jî were zewicandin. Zewaca bi zorê li Almanyayê qedexe ye. Tu kes di bin 18 salîyê de nikare bizewice.
- Her cure şidet çi di nav jin û mêrên zewicandî de be çi li hember zarokan be, ji hêla yasayan ve tê cezakirin. Şidet bi gelek awayan pêk tê: Her kesekî ku êriş bibe ser mirovên din, gef li wan bixwe, heps bike an jî jîyana kesekî din teng bike an jî bi zorê peywendîyeke cinsî dayne, yasayan têk dibe û dikare were cezakirin.

Ev tê çi maneyê ...?

... Ji bo ol û jîyanê

- Li Almanyayê dêr û dewlet ji hev cihê ne. Tu kes bi olekê nayê pênasekirin. Her kes bixwe biryar dide ka çi bike û bi çi bawer bike.
- Hemû cihêkarîyên her qadeke jîyanê yê li ser cinsîyet, rengê çerm, ol an jî terciha cinsîyetê qedexe ye û ji hêla yasayan ve tê cezakirin.
- Her kes bixwe biryar dide ka bi kê re wexta çawa û bi kê re derbas bike.
- Li Almanyayê ji bo jinan jî lixwekirina kincên vekirî tiştekî normal e. Vexwendîna mêran tu car nayê maneya qebûlkirina peywendîyeke cinsî an jî nîşaneyeke daxwaze peywendîyeke cinsî.
- Êrişên cinsî ji polîsan re dikarin werin ragîhandin û ji hêla yasayan ve werin cezakirin.

Dema ku jinek bêje "na", ew tim tê maneya NA.